12.07.2020
Rûpela 1 ji 2yan

Pressestelle
Staatskanzlei 40213
Têlefon 0211 837-1134
0211 837-1405
yan 0211 837-1151

presse@stk.nrw.de
www.land.nrw

**Danxuyandin - 569/07/2020**

# Wezîr Laûmann: “Li dijî enfeksîyonên nû pêkanîna qaydeyên hîmî dewam – em ê serbestîyan wek kesên xwedanberpirsîyarî bi kar bînin”

## Meclis, ji guhartina di Qaydeyên Parastina ji Koronavayrusê re û Qaydeyên Geştê re erê kir / dê heta 11ê Tebaxê bê dirêjkirin

**Wezîrê Karkirinê, Sihetê û Karên Civatî vê danxwiyandinê belav kir:**

Meclisa Bakurê Ren-Vestfalyayê îro di Qaydeyên Parastina ji Koronavayrusê dv Qaydeyên Li ser Geşta Hatîyan de guhertin pêk anîne û ji bo dirêjkirina wan a heta 11ê Tebaxa 2020î biryar daye. Wezîrîya Karkirinê, Sihetê û Karên Civatî dê di demeke pir nêzîk de biryarên binavkirî bibuhurîne.

Wezîrê Sihetê Karl-Josef Laumann vê eşkere kir: “Di enfeksîyonê de bipêşketinên erênî dewam dikin, ev jî bi awayekî mezin keysa firehîyê dide, lê ji bo em bigihîjîn serbestîya bêtir divê em wê bi xwedanberpirsîyarîyê bi kar bînin. Divê em ji bîr nekin ku pandemî hê neqedîyaye, divê em em gelek hay ji xwe hebin û wek kesên berpirsîyar bimînin. Ev li hin cîhên xuyandî ji ser “xalên bibandor” tên nîşandayîn. Tevlî qaydeyên tevahî yên paqijîyê sê xalên hîmî hê jî divên: pêdivêya navberê, pêdivîya parastina dayîna ber devî û difnî û peyderkirina taqîbkirina zincîrên derbasbûnê.”

Guherînên heyî yên li ser Qaydeyên Parastina ji Koronavayrusê dê sînorê jimara tevlîbûyîyên çalakîyan bêtir bike. Ev di hîmê xwe de çalakîyên taybet, û nexasim bi awayê pêkanîna qaydeyê bi têkilîkirinê taqîbkirina mêvanan êdî têkilîya xwe bi dawetên heta 150 kesên tevlîbûyî heye. Dê heman tişt ji bo cenazeyan jî derbasdar be. Ji bo çalakîyên kulturî û yên din sînora peyderkirina konsepta hîjyenê ji 100 kesî hatiye derxistin 300 kesî. Ji bo sportên pêbûnê yên cîhên hundirî sînora tevlîbûyîyan ji 10ê hatiye derxistin 30yî. Sînorê temaşegerên destûrdarî jî dê ji 100î bê derxistin 300î.

Ji bilî van ji bo gerokên ji cîhên bixeter hatî guhertinên giring hene. Bi awayê ku demildest bikevin rewacê, Qaydeyên Koronavayrusê yên li ser Gerên Tevahî, ji alîyê Dezgeha Robert Koch ve

Yên diçin derveyê welêt û testa Koranavayrusê ya ên hatî pêk tê û di encama vê testê de yên çûyî û hatî ji hin kêmkirinan serbest dibin, ji bo ew ji van kêmkirinan serbest bin hebûna testa têr giring e.
Cudakirinên ji karantînaya mecbûrî jî li gora vê hatine kêmkirin. Rêncberên "jêrzemîna bixeter" ên bêhnvedana xwe vêga li cîhê bixeter dibihurînin dê êdî heta ji testê encama neyînî nestînin, êdî ji ber xwe ve neyên cudagirtin. Ev ji bilî vê ji bo serdana nêzîkên rêncberan ên li cîhên bixeter jî derbasdar e. "Heta ku serbestîya bêtir mumkin bibe, heta mumkin be zûtir binavkirina kesên derbasî wan bûye û eger bivê empozekirina me ya kêmkirinên pêbûnê yên asa ew çend giring dibe. Ev, ji bo xeterên ku di bêhnvedanên havînê de giringtir dibin, xeterên derbasbûnê yên mezintir ên wek serdanên cîhên bixeter jî derbasdar e.

***Eger çi pirsên we hebin ji kerema xwe bişînin nivîsîngeha çapemenîylê ya Wezîrîya Hundirî - têlefon: 0211 855-3118.***

***Ji bilî vê yek dikare ji vê sîteya înternetê ya Birêvebirîya eyalete jî xwe bigihînê vê metna çapemenîyê: www.land.nrw***

***Siyaseta veşarîbûnê ya çapemenîya civatî***